

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



*newroz*



*pîrozbe*



"ZAROK FÊKIYÊ MALANE"





Hevalêt heja!

Min divê ez berî hemî tiştî gelek silavêt germ û biratî bo hewe û hemû hewkarêt kovara "KULÎLK"peşkêş bikim.

Eve yekemîn car e ku kovara kulîlk digehîje destên min. Bi rastî jî ev xizmeta ha xebatekê gelek hêja ye û pêvîste ku berdewam bike.

Lê dixwazim ku rexneka di cih de li hewe bigrim û divê hun jî vê yekê qebûl bikin, ku di aliye belav kirina kulîlkê de hewe gelek kemasî kirin e. ....

Daxwaza min, jî iro û pê de, hun min jî belav kirina kovarê bê pehr ne hêlin.

Bi silavet biratî

Mizgîn

13-3984.ORMIYE

## N E W R O Z

Berîya niha bi hezar salan, hikimdarek hebû. Jê re digotin Dehak. Dehak ji aliyê zordestî, zilm û hovîtiya xwe ve gelek deng dabû. Ew, gelek tada li ser gelê me yê Kurd dikir û gelek ji wan dikuşt.

Li Kurdistanê, bav û kal û mezinên me dibêjin, ku Dehak du marên wî hebûn. Ew, wan marên xwe bi mêjiyên zarokên ve xwedî dikir. Ji ber vê yekê jî Dehakê xwînxwar ji bo xwedîkirina marên xwe serê gelek zarokên Kurdan jêdikir û mêjiyên wan dida marên xwe.

Çiqas dem derbas dibû, hewqas jî ji zarokên Kurdan kêm dibûn. Hema hema ji her malbatên Kurdan zarok dihatin kuştin ji bo xwedîkirina marên Dehakê zilmkar.

Ji wan malbatan yek jî ya Kawa bû. Kawa bi xwe hasinker bû û bi xwêdana xwe neh zarokên xwe xwedî dikir. Lê Dehakê çavsor heşt (8) zarokên Kawa jê girtibûn, serên wan jêkiribûn û mêjiyên wan jî dabûn marên xwe. Kawa bi xwe insanekê pir melûl û di halê xwe de bû. Hebûn û tunebûna wî zarokên wî bûn. Piştê ku heşt zarokên wî tîn kuştin, Kawa û jina wî bi xem û qehran tije bibûn. Lê belê heta wê çaxê tişteki ji destên wan nedihat. Ji ber ku, ew

ji baş dizanibûn, ku bi tenê nikarin li hember Dehake xwinmêj rabiwestin.

Roj derbas dibin, Kawa û jina wî he eşê wan derbas nebûye, ku leşkerên Dehak tên û zarokên wan yên nehan (9) ji wan dixwezin û dibêjin:

- Kawayê hesinker, dîsa dora te ye. 21'ê Adarê hikimdarê me Dehak ji bo marên xwe mêjiyê zarokê te divê. Pêwîste, tu zarokê xwe di 21'ê Adarê de teslimê me bike!

Kawa li wan vedigerine û dibêje:

- Leşkerno, heta niha min heşt zarokên xwe ji bo marên pis yê Dehake xwinmêj feda kir. Hun niha zarokên min yê dawî ji min dixwezin. Êdi zarokên dayîne li ba min neman.

Leşker, li ser gotinên Kawa ecimayi diînin û jê re dibêjin:

- Tiştê ku ji me re hatibûn gotin, me ji te re got. Êdi tu bi kêfa xwe yî.

Du re leşker derdikevin û diçin.

Kawa û jina wî dimînin tenê û li xwe diheyirîn. Du-sê roj şun de, divê zarokên xwe yê dawî ji bidin Dehak. Dil û kezeba wan dişewite. Piştê çend got û bêjan jina Kawa ji mêrê xwe re dibêje:



- Kawayê bavê zarokên min, ev çî tofan e hatiye serên me. Heta niha min heşt zarokên xwe winda kirin. Ger min bikujin jî, ez dê zarokê xwe yê dawî nadim Dehakê xwinmej. Ma gelo di vî welatê de em bi tene nin? Tiştê ku ez dizanim, yên wek me gelek dê û bav henin, ku dilê wan jî dişewite, lê ji destên wan jî tiştêk nayê. Heke em dê bi wan re biaxafin û yek bin, hingê em de karibin bi hev re li hember Dehakê zilimkar rawestin.

Kawa jina xwe pir bi diqet guhadar dike û piştê xeberdana wê dawî tê, jê re vedigerîne:  
- Bi Xwedê, tu rast dibejî diya zarokên min. Ez dê niha rabim û herim cem dê û bavan, ku yên wek me dilşewat in.

Pişt re Kawa radibe û mal bi mal digere. Kawa û kesên din gotinên xwe dikin yek. Di dawiyê de Kawa ji wan re dibêje:

-Ez dê şeva 21'ê Adarê de bi zarokê xwe yê dawî ve herim ba Dehak. Jê re dibêjim; va ye min zarok aniye. Ez dê têkevim oda wî û wî bikujim. Hun jî li ser çiya bin. Ji xwe Dehak wê şevê cejna biharê pîroz dike. Serê wî dê xweş be. Gava ku min Dehak kuşt, ez dê aqirekê şanê we bidim û hun jî êrîşî qesra Dehak bikin.





Şeva 21'ê Adarê, Kawa diçe qesra Dehak û li gor pîlanên xwe wî teslîm digre. Dehak çiqas lawayî dike jî, lê nikare dîle Kawa hûnik bike. Kawa, serê Dehakê xwînmêj bi çakucê xwe dipelixîne û bi agirê ve îşaretê di-de ji kesên li ser çîyan re. Xelkê ji çîya dadikevin qesra Dehak û bi hev re leşkerên mir-dar jî dikuşin.

Piştê ku Dehak û leşkerên wî tîn kuştin, xelk derin bajêr û li her derê agir vêdixin. Şuna Dehak de, ji xwe re hikimdarekê pir baş bi nave FERÎDUN hildibijêrin û êdî kêf û xweşî de jiyana xwe didomînin, heta ku Dehakên nuh peyda dibin.

Ji ber vê yekê ye jî, gelê me her sal di 21'ê Adarê de agir dadidin û bi vî awayî wan rojên tarî bi bir tînin û NEWROZ piroz dîkin.

Şagirtên hêja!

Me, di hejmara 12'dan de beşek ji helbesta xwendevanekî kulîlkê, bi navê Kardox pêşkêşî we kiribû. Di vê hejmarê de jî em dixwazin ku beşa diduwan ji we re pêşkêş bikin.

Kulîlk

"Zaroyê te bê guneme"

Gava qîzek bi navê Şahnazê  
Wek çêlikên çûkan li ser daran dida sazê,  
Tiliyan li tembûrê dixist û dikir awazê  
Bi hogirên xwe re Şêrîn û Nesrîn,  
Didan lîliyan li ser giyana hevalên xwe  
Leyla û Hevîn.

Aramke welato! .

Dengê sirûda Newrozê,  
Li deştan li newalan zozanan,  
Giyana şehîdan şiyarkirin,  
Bi dehol û zirne govend û sema kirin.

Navbera tariyê û roniyê bi tenê perdake  
Medigrî !şahiyê tu bes li xweke.  
Kî di wêre bêje te ev fîstana ne pak e.

Evîn bûye pêt di dil de,  
Çemê Ferat jî nekarî bi destên xwe ew hilda.

Tu bes aramke!

Gupikên baxên te dilşad dibin,  
Ava kaniyên te rûgeş dibin,  
Medigrî! Tu bi tenê bi kene welato.

Refên Pêşmergan li rê ne,  
Zaroyên te hemî li pê ne.

Tu bi tenê bikene welato!

Bikene...

Bikene...

Bikene...!

KARDOX



Pisîkê jîr û zana û serpêhatî, mişk di malê de nehiştibûn. Mişkên malên çîrana êdî ji tirsawî newêrîbun bihatana çan û rexê wî. Lê pisîkê kone dil dibijîya mişkan. "Mixabin" pisîk pîr bibu bi bezê û xwewestanê ne ma karî bû mişkan bigre.

Pisîkê min û te rûnişt, ponijî, da û stand kirî û firot, da ber hev, virde anî wêde bir ku ji bo berdevam kirina jiyana xwe divê deverek mişkê wêpir bibîne û bi rebaziyeke nû karê xwe yê berê pêkbine ango bi hesanî mişkan bigre û bixwe.

Pisîkê şît û kone, kurk, tizbî, şaşik û berik bi xwere hilanî û dest bi rêwîtiyê kir. Pîr çu hindik çu rastî xopanekî hat, gulên mişka yê pîr zû naskir. Û ji xwere got: -Min cîye (cîgehê) xwe dît.

Pisîk, berik raxist, şaşa xwe da serê xwe kurk avête ser piştê xwe û bi tizbiya xwe ya 101 (sedû yek) lib dest bi selawat û Alah... Alah... kir.

Mişka saloxê vî mevanê bê deng bihîstî û bi lez bi hevudû gerandin.



Kur û pista mişkan tev li ser vî mevanê kes-  
nedî diciviya.

Mişka ji hev re digotin:

- Kuro ev kiye hatiye xopana me?
- Ez nizanim, ka emê ji pîrê me bipirsin.
- De rabe vaye mezineki me jî hat...
- Mamo ev çi tebaye?

Pîre mişk:

- Lawo ka xort temaşe bikin bê çi nişanên wî  
ne? hingê ezê tişkî bêjim.


Du mişkên ciwan û çeleng qet pisik nediti-  
bûn, bi lez çûn dora mêvanê bê deng dane çere-  
fita, lê mêze kirin.

Pisik her ma bê deng, li alî mişkan bi carek  
nenêrî, selawat û nimêja xwe xurt kir.

Mişkên çeleng zivirîn nav koma mişkan û go-  
tin wan:

- Geli bira! her selawata dikşîne nimêj dike  
xweda...xweda...wî ye. Lê simbêlê wî wihane,  
dev û diranên wî lep û reng wiha, terî (dûvik)  
ya wî bi vî awayî...

Pîre mişk got:





-Lawo gelî mişkan Ewê nişana wî bi vî awayî ji pisîk pêve ne tişteke. Belkî we ne dîye lê em yên pîr, baş dizanin û dijminê xwe yê çanî çanî baş nasdikin. Evaya dijminê nijada me mişkaye, hun bi gura min dikin jê dûr bin bi xêrtire.


Gava pîre mişk wiha got, xorta bawer nekir. Bawer nekirin lewra bi serê wan ne hatibû. Xwîngermî û xeşimî bêtir rê nişanî wan dida. Hema çend mişkên ciwan ku pisîk yekcar nedîbûn, ji qula xwe bi tirs derketin, çûne rexê pisîk. Lê pisîk hêj xwe xam dike, qet guh neda wan.

Mişkek ber bi wî hat û got:

-Em dixwazin te nasbikin. tu dostî an dijminî û tu weke pisîkî. Ka xwe bi me bide naskirin.

Pisîk gote wan:

-Ez ne pisîkim. Ji min re dibejin Lawê Law Çavşor. Ez mirovekî di rêya xwedê de me. Dijminaya min bi kesîre tune, zû dûri min herin bela xwe ji min vekin, hûnê ni-mêja min li min bi borînin.



Pisîkê me bû Lawê Law Çavsor, li ser be-  
rika xwe, tizbî di stû de dest bi olperes -  
tîya xwe kir. Mişkên reben dev ji hev man .  
Li dora wî dîsa çûn û hatin. Hilkişîyan ser  
serê wî, ser milên wî û heta ketin hambêza  
wî jî. Lawê Law Çavsor xwe kirûmat kir,


Mişk bi dil xweşî zîvirîn nav mişkan û  
ji wan re gotin:

-Me çû saxtî kir, ev ne pisîke. Lawê Law  
Çavsore. Ji nimêj û selawata pêve tişteki  
nake, û me jê pirsî, ewî ji mere got:

-Ez ne dijminê kesîme.

Mişk, bi vê saloxê pir dilxweş bûn. Ê bi ser-  
bestî çûn û hatin. Kesî li pîrê mişkanê hove-  
neda. Ji gulên xwe derdikevin tîn, diçin, La-  
wê Law Çavsor nimêj û tizbîyên xwe li ber  
çava di domîne, eşkere qet guh nade mişkan.  
Her xwe xam dike.

Lawê Law Çavsor, yêk cara keysê li çend  
mişkantîne bi dizî dixwe û yên mayî jî, ji  
bo xwe vedişêre. Bi vî awayî mişk, roj bi roj  
kêm dibin. Ê pisîk jî qelew dibe. Her roj hi-  
nek ji wan mişkan kêm dibin. Tu şop û nîşan  
li pêy wan xuya nedikir.



Mişk, li hev pirsîn, hevûdu jimartin, dîtin ku bêşek xurt ji wan kê m bûye. Pirsîn, geriyar kes tune. Winda bûne. Mişkên reben geriyar, li xwe dan, lê bê kê bû. Wê gavê pîre mişk (mişkê bîrwer) gote wan:

- Min berê ji ve re got. Ev pisik e. Hun li serê xwe siwar bûn, we bi ya min nekir. Ji pisikê pêve kes dijminê me tune, ku van tiştan bi me bike. Her çiqas şaşikê girêbide û cubbe li xweke, tizbî û selawata bikşîne, bi nimêj û niyazê me bixapîne jî, dîsa dijminê me ye..

Miškeki bi jarî û tirs lê ve gerand û jê pirsî:

- Raste bi Xwedê. Roja ku nû hate vir, lawê law çavsor hestî û çerm mabû. Birçî bû û bîna genî jê dihat. Ne diçû deverekê, ne digeriya, kes nedidît çî dixwar.

Lê iro xurt bûye, pirça wî wek rûn lêdayî tev ji xwîna me ye. Ka em çî bikin ezbenî. Rêkê jê re bibîne.

Mişka teva dest bi lava kirin û çare xwestin.

Pîre mişk gote wan:

- Divê em zengileki peyda bikin û yek ji me bibe bixe situyê wî de.

Gava bi rê ve here deng were me, da ku em bi-  
zanibin ew li ku ye-û bi vî awayî em karibin  
xwe biparêzin, ta ku em rêya rizgarbûna xwe  
baş nasbikin.

Ew mişkên ku, her çend rojan birek ji wan  
kêm dibûn, dihatin xwarin, man bê çare û li  
hev geriyên. Û dîsa bû kurtepista wan...

Lê mixabin yekî li xwe negirt ku zengil bi-  
xe sitûyê pisikê xwînxwar.

..../....

## FERHENGOKA

Serpêhatî	: Tiştên ku hatiye serê mirov.
Çan û rex	: Der û dor.
Kone	: Jîr, bêbext, fenbaz...
Mixabin	: Heyf.
Rêbaz	: Program.
Şît	: Jêhatî, kêrhatî.
Berik	: Sicade, mêzera nimêjê.
Xopan	: Xerabe, pang.
Salox	: Xeber, nûçe.
Çeleng	: Bedew, li ser xwe, dînç.
Lez	: Zû, ecele.
Çirefît	: Lez û bezên biçûk.
Li gor min	: Bi dîtina min.
Ker û mat	: Ker û lal.
Saxtî	: Şûna tecrûbe cîh digre.
Hovedan	: Guhdan.
Hovenedan	: Guhdarnekirin, guhnedan.
Şop	: Dewes, delîl, rêç.
Beş	: Kisim.
Bîrwer	: Zana. Jîr.
Jar	: Reben, belengaz, xizan.
Kê derê	: Kîjan deverê.
Qanî qanî	: Di mana dijminê bê rehm û kevn de ye.

" Ger, mirov bixwaze dareka fêkî  
biçîne û berekî xweş jê bixwe,  
divê di destpêkê de mirov guh  
bidê, dora wê xweş bike, av bidê  
û biparêze."





ŞİRETÊN  
EHMEDÊ XANÎ

Rojekê Ehmedê Xanî şêst zaroyên kurd-keç û kur-birin mala xwe û ji wan re daweteke mezin da. Piştî di nav wan de rûnişt û ji wan re pirsên jêrîn gotin. Divê hon wan di dilê xwe de veşêrin, ji ber ku, rêber û zaneyê me ê mezin ew ne ji wan şêst zarokên bi tenê re gotine, lê ji bo hemî zaroyên kurd re. Gotinên rehmetî ev in:

Hon piçûk in, hon geş in, bê derd û xem dileyîzin û dikevin; ev dema dilxweşiyê ye.

Eger hon dxwazin her gav bextiyar bibin û tucaran pir bedbext nebin li du tiştan bigerin; hejkirin û xebat.

Kî hejî we dike hejî wî bikin; îro hejî merivên xwe bikin; hejî diya xwe, hejî bavê xwe bikin, hejî-hevalên xwe bikin, piştî honê hînî hejkirina diya me gişan Kurdistanê bibin.

Ê didoyan; bixebitin; îro ji bo hînbônê, ji bo zanînê bixebitin; da ko halê dinê bizanîn, bi pêş ve herin, bibin meriv, bibin hêja, bibin serdest, bibin Insan !

Gava hon dersên xwe baş dizanin, dilê mamosteyên xwe xweş dikin. Hon dibînin ko hon jî geş dibin, ji bin barekî giranxelas dibin, sivik dibin.


Ev hergav holê ye. Bixebitin da ko wijdana we her gav ji we razî be! Û gava wijdana însan rahet e û dilê wî bi kêf e, ew însan tucaran ne bedbext e.

Zaroyên min ên delal! niha ji bo xatirê min têr bixwin! vexwin! û bikenin! Ez bi wê bextiyarîm, ez dixwazim hon jî bi min dil xweş bin, da ko welat jî bi hejkirina me hev û du hergav şa be !

Nûredîn Ûsif

"HAWAR-Hejmar:9 Sal:1941"

...../.....



## P Ê K E N Î N

- Alah û yek Bir-

Di gundekî de meriwek bi navê Hecî Hesen hebû. Ji ber ku ew çû bû Hecê, jê re Hecî Hesen di gotin. Hecî Hesen, merwekî dilpaqij û baş bû. Rojek ji rojan pîreka Hecî Hesen, ji bo şîva êvarê kutilkan çêdike. Kutilkan dixê legenê û datîne nava odê.

Di wê navberê de Hecî Hesen, destnimêja xwe digire. Dikeve ser sicadê û nimêj dike. Pîreka Hecî jî piştî xwe daye hêt û diponije. Hecî Hesen liser nimêjê dibîne, ku va pisîk hat û rahişte kutilkekê û çû. Hecî li ser nimêjê bi hêrs ket û got:

-Alah û yek bir !

Jina Hecî tişteke fêr nekir. Piştî qedereqê Hecî carekedin dibîne, ku va pisîk hat û rahişte kutikekê din. Hecî carekedin bi hêrs ket û got:

-Alah û dida bir !

Jina Hecî dîsa tişteke fêr nekir.

Piştî qederekê Hecî dîsa dibîne, ku va Pisîk hat û rahişte kutilka sisiyan Hecî yêk carî bi hêrs ket û nema dizanî bû. Li ser nimêjê çî dibêje Hecî bi hêrs got:



-Alah û sisê birrrr!...

Jina Hecî careke din tişteke fêm ne kir  
Hecî nema dizane bê çi dibêjê. Carekê He-  
cî dît, ku va pisîk hat û dike rahije ku-  
tilka çaran.

Hecî yekcarî bi hers ket. Hema pêhnek  
li pisîkê xist, ew pelikand û ji jina xwe  
re got:

-Mala bavê şewitîyê, Alah û çar bir,  
pisîkê kutilk tev xwarin, ma tu korî?  
Û nimêja li wir xerab kir.

28.4.1983

Birîndar

R Ê K A   D Î B Î S T A N


Min dî rojek ji rojan  
Ciwan, Rezan û Hozan  
Li ser rika dibistan.  
Hersê ji hevra dibêjin:  
Va gotinan bi stranî  
Em biçûkên Kurdistan  
Va em diçin dibistan.  
Dijmin çavê xwe veke,  
Sibê limin meyzeke.  
Em biçûkin dilmezin  
Ji sitem te na bezin  
Ranamûsin digezin  
Me, bese ji hêvîya  
Ji xwestin û xwezîya.  
Emê herin dibistan  
Da em bibin xwendevan  
Şadî binin Niştîman.

Dijmin, tu car şa nebe,  
Qelemê me wek şûrin,  
Şîretkarê me pirin.  
Wê li me bên rojên xweş  
Cîhan li te bibe reş.  
Lê em ne wek te hovin  
Xweş nasin, xweş mirovin.  
Em ew gedê dilovan,  
Jîr û zane û hozan,  
Daxwaza me jîn û man  
Welat derxin ji bin destan.  
Sekinîm li pêş hersîyan  
Cîwan, Rezan û Hozan.  
Mi go, lawo çi dibêjin  
Kulîlkê şax û baxan.  
Her sîyan bi hevra sond xwar  
Ji dilekî birîndar,  
Bi hêsrên Diya Cîwan  
Bi hesreta bav û kalan  
Emê îro bixwînin  
Sibê herin ser çîyan.

DIYA CÎWAN-1982







Gelo hun dikarin alfikariya pisikê bikin, ku bikaribe xwe biqêhêne gu- loka ris ê jêrîn.

## SERPÊHATIYA GUR

Mîha ku li mêrgê diçêriya, rojekê fikirî û bi xwe-xwe got:

-Ma qey ez dêhn im, ku ez bi serê xwe li van çolan diçêrim? Na, divê ku ez ji xwe re notirvanekî peyda bikim, da ku canê min biparêze.

Hîn ew wêlê difikirî û bi xwe-xwe dipeyvî, hew dît ku kûçikê (se, seg) di ber wê re derbas bû.

Hema mîhê zû ban kûçik kir û jê pirsî:

-Birayê kûçik, gelo tu nayê ji min re notirvaniyê nakî?

Kûçik terya (dêl, boçik) xwe kil kir û got:

-Ma tu ê rojê çiqasî bidî min?

Mîh piştî ku hebekî fikirî, bersiv da:

-Ez ê rojê sê tas şîr bidim te û ez tu karekî giran bi te nakim. Tu ê tenê notirvaniya min bike, da ku tiştêk bi min neyê.

Kûçik û mîhê bi wî awayî li hev kirin. Mîhê rojê sê tas şîr da kûçik. Her roj, her ku mîh diçû mêrgê diçêriya, kûçik diçû notirvaniya wê dikir û ew diparast.

Rojekê gurek di ber mêrgê re derbas bû, dît ku mîhek li mêrgê bi serê xwe diçêre. Gur ber bi wê çû û jê re got:

-Qey tu nizanî, ku ev mêrga han ya min e! Tu bi destûra kê li vê mêrgê diçêrî?

Piştî ku mîhê giyayê di devê xwe de cût, got:

-No, ez ji te bawer nakim, ku ev mêrg ya te ye. Ger ku tu li mêrgê xwedî derdikevî, divê ku tu ji min re sond bixwe, da ku ez ji te bawer bikim. An na ez bawer nakim, ku ev mêrg ya te ye!

Gur çend gavên din ber bi wê de avêt û got:

-Baş e, ka sonda te çi ye, tu ji çi bawer dikî?

Mîhê bi serê xwe ziyaret nîşanî gur da û got:

-Divê ku tu sê gavan ber bi vê ziyareta han ve bi-avêje û tu bêjê "Bi vê ziyaretê, ev mêrga han ya min e". Hingî ez ê ji te bawer bikim, ku bi rastî ev mêrga han ya te ye.

Gur pêşniyaza mîkê qebûl kir û gavên ku ber bi ziyaretê ve avêtin, hejmart:

-Ev yek, du, sisê... Bi vê ziyaretê ev...

Hîn peyva gur di dev de bû, kûçik ji nav deviyê pekiya û xwe avêt ser wî. Dû re danî erdê û ew ji wê rewşê derxiste xiste rewşeke din. Gur xwe bi zarê ji nav ðepên kûçik derxist û bê rohnî baz da. Qederekî wisan beyî ku li paş xwe binihêre reviya. Dû re sekinî û li paş xwe nihêrî, gava dît ku kes li dû wî tune ye, hêdî hêdî meşiya. Îcar di ber mêrgeke din re derbas bû. Dît ku cehniyek xam li mêrgê diçêre. Hema bi lez çû nik cehniyê û jê pirsî: -Te ji kê destûr stendiye, ku tu li vê mêrga han wisan diçêrî? Wele ez ê te bixwim!

Cehniyê stûyê xwe xwar kir, li ber geriya û got: -Hey tu ê min bixwî, balo li min siwar be, da ku miradê min di qirika min de nemî ne.

Gur got:

-Baş e.

Xwe avêt ser piştê cehniyê û lê siwar bû. Cehniyê du-sê lotik dane xwe û vir de û wê de baz da. Dû re ber bi gundekî de baz da û kete nava gund. Gundî ra bûn ew çî bibînin, ku gurek li cehniyê siwar e û cehnî vir de û wê de dide lotikan. Gundîyan bi dar û keviran êrîş birine ser gur. Bi lêxistinê, dîsan gur ji wê rewşê derket kete rewşeke din. Lê gur bi wê birîndariya xwe, xwe bi zorê ji nav destên wan derxist û bê rohnî baz da. Çû ser çiyakî bilind û bi xwe-xwe got:

-Ku xwediyên min hebûna, heqê wan bû, ku niha bi dêlâ min bigirtana û ez li belika guhên van teht û daran xistima. Ma lawo, bavê te sofî bû, kalikê te li hespan siwar bûbû, ma ji te re çî lazim, ku tu here li hespan siwar bibî û bi ziyaretan sond bixwî? Wele xwediyên min tu ne. Ku xwediyên min hebûna, heqê wan bû, ku ez bikuştama!

Peyak ji bo ku ji baranê şil ne be, xwe da bû bertalda tehtekî. Gava ku dengê gur bi wî awayî çûyê, mêrik ji cihê xwe rabû û got:

-Hema ji min çêtir tune ye!

Mêrik bi teriya gur girt û li wan teht û daran xist.

Gur xwe bi zorê û bi nîvmirîtî ji nav destên mêrik derxist û dîsan bê rohnî baz da. Îcar çû ser çiyakî herî bilind û asê, li dora xwe nihêrî û bi tirs got:

-Lawo, ma vî zemanî bû ye, ku kes hew diwêre di ma la xwe de galgalekê (peyv) bike. Ma ev çî zeman e gidî?

F. CEWERÎ



Xwendevanên hêja!

Çîroka bi navê "SERPÊHATIYA GUR" di hejmara duwanzdan(12)de hatibû nivî sandin. Di nivîsandinê de hinek kêmasî û xeletî çê bûbûn.

Rastiya çîrokê weke ku li jor hatiye nivîsandinê ye.

KULÎLK

M I J Û L Î



Di nav her du wene yê jorîn de,  
10(deh)tişt ne wek hevin.Gelo ew tişt  
çine ?

## ÇAÇANÊ



Axlê yeman Çaçanê  
Yaxû yeman Çaçanê  
H'imra peyda quy sanê  
Çaço çûbû ser bîrê  
Av kişandî bi zincîrê  
Zincîr qetya ket bîrê  
Destê xwe bi destê Çaçokim  
Bavêm welatê Cizîrê.  
Axlê yeman Çaçanê  
H'imra peyda quy sanê  
Çaço dibû li ser dikê  
Av kişandî bi elbikê  
Zincîr qetya ket dikê  
Destê xwe bi destê Çaçokim  
Bavem welatê Dêrikê.

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPANGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr  
BIHA